Rafik Schamis Ratschläge auf Kurdisch

Mamoste Şamî, hun ji salên 1970an de ji Sûriyê derketine û hatine Elmaniya. Çi hêviyên we ji penaberan hene, yên dixwazên di nav miletê mede bijîn?

Rafîq Şamî:

Di vê dema zor de, hêviya alîkariyê ji her kesî dikim, nexasim yên navê zaniyariyê li xwe dikin. Yekemîn tişt em bikin ewe, ku em dialog û danûstandinê di nav xwede bikin û ne di destên dimagojan û dijminên mirovan de berdin.

Bi gûmanim ku ev deh nuqtê ez bi navnişan bikim xizmeteke mezin ji alîkaran, dilxwazan û jibo parastina penaberan re giringin. Ezê daxwiyanên xwe di van nuqtande bi kurtî bêjim, cih ji melaqî û galagalên valan re nahêlim, Jiber derdê min parastina penaberan û pakkirina jiyana wan li gel miletê elmanan re ye.

1. Îroj roja raman û dialogên azade, dûrî tirs û tabûyan. Ta roja îro Penaberan nikarîbûn ev tişt li welatên xwe kiribana. Çend pirsgirêk hene ku nerîna rexneyî bi pêş ve bibin: Çima em gihiştine vê bêtarê? Di despêkê de rola eşîret û eşîretiyê heye, rola petrolê ku di hindik destan deye ku miletê herêmê xizan hiştine, wisa jî rola diktatorên weke mafia welat bindest kirine, û dawî tevheviya ol û siyasetê.

2. Penaber divê nasbikin bikin, ku ew hatine welatekî ku di kultur û ola xwede krîstiane. Ev welat wan hembêz dike, ew nikarin vî welatî ne nêzîk ne jî dûr biguherin. Lê belê rê li pêşiya wan vekiriye xwe pêşxin û cihekî ji xwere di avakirina vê kultûrê de bibînin. yekemîn divê ew xwe fêrî zimanê vî welatî bikin.

3. Divê penaber zanibin ku wekheviya zilam û pîreke li vî welatî piştî şerin sedsalî bi cî hatiye û qanûna welêt vê wekheviyê diparêze. Newekhevî nîvê miletê ereb û misilman pûc dike.

4. Welatên ereban, yên zengîn, penaber bi tenê hiştine. Ev welat dibêjin ew musilmanin lê xwiyaye ew dijî quran û pêxemberin. Heger van welatan alîkariya penaberan kiriba, van xwe talan nedikirin jibo ji xwere warerkî li Oropa bibînin.

5. Em hemû dizanin ku mêhvan êsîrê mazûvane. Lê ev welat rûmeta xelkê xwe û mêhvanên xwe jî diparêze. jiber wilo penaber ne êsîrê elamanan ne, lê belê ew mêhvanin bi mafin ku qanûna welêt eşkere dike. Luqmanê hekîm dibêje: Kevran navêje bîra ku tu jê vedixwe.

6. Spasiya penaberan ji vî welatî re, ne wisa ye ku ew durûbin, xwe pêş elamanan pîs bikin, û di nav xwede kenê xwe bi wan bikin. Ev nexweşiye, şêzofrînîa ye, sedema wê ewe, ku wan dehê salan bindestiyek dijwar derbaskirine. spasiya pak ewe, ku em qedrê dildar û alîkaran bigrin, ewên ku dem û enerjiya xwe dixin alîkariya penaberan, jiber ew welatê xwe nasdikin û ew bitenê garantî dijî nijadperstiyê ne.

7. Civata elmanî civatek demokrate, qanûna wê garantiyê dide azadiyâ milet. Ji yekî nenas re tê xwiyakirin ku miletê elman qelse. Lê na, ew herdem dikare di riya qanûn û saziyên xwere berxwe bide. Divê penaber û mihacir guh nedin kesên wan bi aliyê sûc û pîsiyê de daf didin. Wateya dûrbûna polis û artêşê ji rebenkirina milet, di riya haziriya çekdarî de, ne ewe, ku qanûn tuneye.

8. Li vî welatî qanûnek tenê heye, ew destûra elamiye. Qanûna eşîrê (urf û adetên eşîrî), yan jî qanûna şerefê (jibo parastina kujerên ku qîz û jinên xwe dikujin), yan jî şerîata islamî, ev hemû li vî welatî nabin. ew kesên tiştekî dî ji penaberan re dibêjin, xêrâ wan naxwazin.
9. Yê ku dibêje, homoseks li welatên erebî û islamî tuneye, durûye. Zor û derew homoseks dixin warê sûc de. Hezarên homo di nav ereb û misilmanan de hene lê ew ji ceza , belê ji kuştinê, ditirsin. Li elamniya xelkê homo, jin yan jî mêr, xebatek dirêj kirine, ta ku gihane wekheviyê liber qanûnê û di nav civatê de.
10. Çi dostê ku bi rêz li penaberan dinere, wan şîret dike, beşdariyê di jiyanê de bikin û pûç nemînin, xebatê bikin bi hêzên demokratîk re, da ku sedemên penaberiya we herin.

Übersetzung: Kamiran Hudsch